



***Agehdarî***  
***Û Ruhinkirinek Bo***  
***Reya Giştî Derbarey***  
***Konfransê Kurdistanî***

**Desteyek ji ronakbîrên Kurdistanê**

Eve çendeke destgehên ragehandinê basê konfranseke Kurdistanî dikan, ku bi gorey dengubasan birriyar e li mawê 1 – 2 meha dahatî li hevlêrê bête bestin. Aşikiraye ew dengubas pêvenidin digel ragehandineka serok komarê Îraqê, Celal Talebanî li çaxê seredana wî jibo turikiyayê xurttir bûyine, ku konfranseke wesa dê li hevlêrê hête bestin.

Em desteyek ji ronakbîrên Kurdistanî, ku her bi wî navî jî li berî çiwar salên tevav (li xezîrana 2005), me dû proje pêşkêşî rêzdarên Mesud Barzanî û Celal Talebanî kirin. Êk ji wan pirojan pêşinîyara bestina konfranseke Kurdistanî yê seranserî (her çiwar parçên Kurdistanê), yê ekadîmî–Ramiyarî bû, ku li hevlêrê bihête bestin û pirojê dî jî naveroka navibjîvaniya desthelata başûrê Kurdistanê bû, dinavbera pekekê û hukmeta turikiya da.



Bi pileya êkê mebest ji wî konfransî ew bû, ku bi rêka diyalogeka ekadîmî–Ramiyarî gotubêj li bara doza kurdan li her çîwar parçên Kurdistanê bêtekirin, vexwandinek li niha ya kurdan bête kîrin û nêrînek Kurdistanî jî ji bo dahatî bête diristkirin... Jiblî hijmarek ji gotarên ekadîmî, ku diviya ji alî yê pispurên kurd û biyanî ve bêne pêşkêşikirin. Mebest ew bû; pişkek girîng ji konfransî jî jibo çîwar wirikşopên hevmînak (jibo çîwar parçên Kurdistanê) bête terxan kîrin, herwesa biriyar bû, ku ragehandineka firealî li domahîka kunfirasî peyda bît, ku dinav da kumelek ji prensîpên neteweyên Kurdistanî bixweve bigirît...

Belê mixabin, piştî çîwar salan ji berçavkirina vî pirojê konfransê Kurdistanî û karu bizaveka mişe jibo bi cihînanana wî, di dumahîk gav da biriyara nebestina konfransî ji aliyê desthelata ramiyarî ve hatedan. Ji aliyekê dî ve bi çaxekî kêr li piştî vê biriyarê xeberê bestina konfransê bi heman navî (konfransê Kurdistanê) serihelda. Li ber ronahiya wan pêşveçûnan me bi pêdivî zanî evê ruhinkirina li berdest bideyne reya giştî ya Kurdistanê:

1) piştî salekê ji pêşkêşikirina pirojê konfransê Kurdistanê anko li havîna 2006 şandek ji desteka ronakbîrên Kurdistanê çav bi serokê civata wezîran, rêzdar nêçîrvan Barzanî kevit, ji bo bercestekirina pirojê konfransî û bidestiveynana piştewaniya wî jibo wê meremê. Rêzdarî gelek bi germî û helwîstekê ji hejî pêşîwazî li naveroka konfransî kir û tekezî li ser serbexweyî û bêlayanî hiştina hewla mekir û soza ewê jî da ku herçî dişiyana wî dabît jipêxemet serxistina kunfirasî kêmatê neket her jibo wê meremê jî budceka taybet jibo amadekarî û encamdana



konfransî terxankir û paşî pitir ji çiwar caran, wek pwîtepêdan û li dwîvçûna berihevkarîyên konfransî, digel me da civiya, li ber ronahiya wê piştevanî û pêgîryê, kumîtek berihevkarîyê bo kunfransî bi merema encamdana Aliyên piraktîkî yê kunfransî pêkhat. Komîte her ji desteya ronakbîrên Kurdistanê û çend endamekên dî û nûnerê rêzdar nêçîrvan Barzanî pêkîdhat.

2) daku berihevkarîyeka baştirê jibo bihêtekirin, kunfransî ducarî hate paşxistin û dumahîk car biriyar ew bû; ku li 16 û 17 û 18 î meha uktobera sala borî (2008) ê li hevlêrê, bi pişkdariya nûnerên pitirtirîn partên Kurdistanê ji her çiwar parçên Kurdistanê bihête bestin û hijmarek mezin jî ji nûnerên civakê medenî û kesianên ramîyarîkar û ekadîmîkar û navendên vekolînê û desthelata ramîyarî ya başûrê Kurdistanê bi her sê serokatîyan ve pişkdar bît. Herwesa biriyar bû hijmarek berikeftî ji pisporên biyanî, şareza dibîwarên dîrok û siyasatên kurdan da (ji ewrpa û emîrîka) berihevî konfransî bibin. Belê mixabin, piştî berihevîyeka gelek mezin, ku çax û hêzeka mezin ji mebir, û piştî wê jî, ku bi fermî mêvan jî hatibûne daxwazkirin, berihevîya cih û rêka konfransî bidûmahîk hatibû, heta hindek ji mêhivanên kurd û biyanî bi merema pişkdaryê di kunfransî da bi Kurdistanê jî geştiyên. Ji nişkan ve (li destpêka uktoberê) biriyara nebestina kunfransî ji Aliyê desthelata ramîyarî ve bi kumîta berihevkar ra geştiy.

3) mixabin, heta niha em, wek desteyek ji ronakbîrên Kurdistanê, hûkaryên biriyara jinşkê ve ya ragirtina konfransî Kurdistanê bi dirisîfî nizanîn û heta noke digel çavênîyeka dirêj binivîsîn ji hukarên biriyara nebestinê wilayên aluzîn wê biriyarê nehatîne agehdarîkirin, bi tinê ew nebît, anku kawdan rêkê bi



bestina kunfransekî bi wî awayî li hevlêrê nadet, bi rastî bersiva wê nama me jî nehatedan ku têda me daxwaza hindêk ruhinkirinan sexmeratî biriyara nebestina konfransî kiribû.

4) giring e li vêre ewê jî bêjîn, ku didemê berihewkariya kunfransî da, kumbûnên têr û tijî û dûr û dirêj digel wan kes û aliyan hatî ye kirin, ku merem bû helwêstê wan li ser konfransî bihête zanîn û naveroka projey li nik wan berceste bi bît û paşî jibûna pişkdarîkirinê di kunfransî da bêne gazîkirin. Diyar e divê ragehandina berdest da nîkarîn navê tevayiya wan kes û aliyan bihênîn, ku jibo wê meremê seredana wan hatî ye kirin û gotobêj digel da hatiyekirin. Her çewabî bi taybetî ewa giring jibo merema vê ragehandinê ya li berdest û peywendî bi hêzên ramiyaryên başorê Kurdistanê û desthelata ramiyarî li wê heye ew e, divê navê hindêk kes û aliyan bihênîn, ku seredana wan hatiyekirin (hindêk jivan pitir ji sê caran) û piştevaniya wan jibo bestina kunfransî bi dest ve hatî ye û jibo pişkdarîkirinê di konfransî da hatîne daxwazkirin, ji wan jî rêzdarên kusiret resol Elî(cêgirê serokê herêmê û cêgirê sikirtêrê giştî yê êketiya niştimaniya Kurdistanê), Umer fetah (cêgirê serokê hukmetê), fazil Mîranî (sikirtêrê mekteba siyasî ya partî dîmukiratî Kurdistan), di. Kemal fiwad (li şûna mekteba siyasî ya êketî niştimanî û wek endamê wê mektebê), Selaheddîn behaedîn (emîndarê êkgirtwî îslamî), qadir ezîz (sikirtêrê parta zehmetkêşên Kurdistanê), Kemal şakir (sikirtêrê partî kumunsîfî Kurdistan), Elîbapîr (emîrê kumela îslamî), Muhemedê Hacî Mehmûd (sikirtêrê parta susiyalsta dîmukirasa Kurdistanê), qubad Talebanî (nûnerê hukmeta herêmê li emirîka, serokê perlemanê Kurdistanê (edinan muftî) û cêgirê wî (Kemal



kerikokî) û hijmarek mezin ji kesianên ramiyarî û ekadîmî û rewşenbîrî û çalakivanên biwara kumelgehê medenî li Kurdistanê. Her hemûyan pêk ve bigermî (diyar e çendekê ji hevcuda) piştevaniya xwe ya germ bo wî kunfransî û têda berhevbûnê diyarikirin û bigire hindekan jî ew soz bi medan, ku hevkarî biken, jibo bi serêxistina kunfransî çî ji dest wan bihê biken. Belê ewa çî dax û sersurmanyê ew e, ku piştî biriyara nebestina kunfransî li heman radey rijdî jibo naveroka kunfransî û bi dûyivdaçûn û xemxorî ya wan Aliyên ramiyarî berçav nebûye (helbet dîsan bi hindek cudahiyan) gelek bi taybetî bêdengiya mekteba siyasî ya êketî û mekteba siyasî ya partî di pîrsa biriyara nebestina kunfransî da, her çûnebît helwêstekî gelek bi çirîset û gumanî ye. Bi baweriya me ew herdû part bixwe li wî biriyarê berpirsiyarin... Ew dû parte divêt bersiva vê pirsiyarê jî biden, erê jibo çî bi tinê jiberî çend mehekan kawdanê başûrê Kurdistanê jibo bestina kunfransekî yan kongirekî Kurdistanî li hevlêrê harîkarinebû, belê niha heman kawdan harîkare, di pîrsîn erê ew çî guhartineka binikarî ye ku li cyografiya ramiyariya Kurdistanê û bihavî desthelata ramiyarî li başûrê Kurdistanê rûday, jibo çî nuke dişiyanda bît kunfransek bi wî rengî li hevlêrê bête bestin?

Her çewabît, divêt rijdî û helwêsitî pozetîvî behra pitira hêzên ramiyarî û kesianên rojhelat û bakûr û jêriya rojavayê Kurdistanê li beramberî naveroka kunfransî û berheviya wan jibo pişkdarîkirinê têda bilind bihête nixandin û tekezkin.

5) aşikiraye, pîrsgirêka giring di berihevkirina kunfransî da doza helwîst û amadebûn yan nebûna pekekê bû di kunfransî da, di helwêstê xweda wê partê wesa dizanî, ku tinê ewin xudanên



naveroka bestina (Kungirekî Kurdistanî) û jiber wê jî wan begem nedikir ku kesanên dî yan hêzên dî yên ramiyarî naveroka Kungirê Kurdistaniyan hebît û jêra karbiken.... Em digelek rêkan da nêzîkî pekekê bûyin jipêxemet jibo kunfransî gazî bikeyin, jibo nimûne her çunebît çîwar kombûn digel nûnerê Kungirê netewî, ku pekeke têda bala destê û biriyardere hatînekirin. Eve û jiblî bikarîna kenal û şêwazên dî jibo zanîna helwêstê pekekê û gehîştin bi serokatiya wî û daxwazkirina wan bi wî rengî ku firehejî bû: Ku mîna berihevkar kunfransî rengê berihevbûna nerastexo ji bo pekekê pêşinîyarikir: Anku pekeke rastewxwe dikunfransî da pişkdar nebît, lê belê pişkdariya wan bi rêka hijmarek kesan bît, ku ewan pê baş in. Heta nûneratîkirina pekekê ji aliyê Kungirê wanê netewî vejî dîsan pêguhurikek vekirî bû me li ser mêzê danay. Belê mixabin pekeke vekirî nebû ewan şêwazan begem biket, geriçî pitirîya hêz û kesanên dî ew şêwazê amadebûna ne rastewxo ya (pekekê) bi wan pesnd bû, û hindekan jîwan kar bi wê arastê kirin. Ji hejî amajê ye, ku me ew şêwazê amadebûna nerastexo ya pekekî bi (şêwazê kunfransê medirîdê 1991) binavikir, ku li wêrê rêkixirawa azadîxwaza felisitînî û serokê wê yasir erefatî begemkirin, ku bi rêka hindek kesanê nerastewxo pişkdaryê di kunfransê medirîdê da biken. Ji hejî bîrînanê ye jî ku hevdem digel pêşkêşkirina pirojê kunfransî li xezîrana (2005) jibo berêzan Mesud Barzanî û Mam Celal, proje bi heman giringî yê, li heman çaxî, bi (pekekî) jî dane.

6) divêt ewê jî tekez bikeyin, ku neher tinê merem bû konfransî li ser doza herçwar parçên Kurdistanê rawesitît, lê belê di



beyana dûmahîkî da destnîşana arêşe û çareseriyên û şêwazên herî hejî û kartêkerên netewyên dibilumasiya kurdî jî biket, bê cudahiya parçeyan. Ne her ew tinê, belê xwastinek jî dinav pirojê meda hebû, paşî dipirosa xwe berihevkerinê da werarikir, ku nabît bi tinê konfiranis diyarda êk carê bît, bi ramaneka dî merem webû, ku kunfiranis bi bîte destpêk jibo peydakirina pilatforim (munteda yan multeqa) yekê Kurdistanî, wek avakirineka netewî û bikarît bi bîte jêderê ji hevnezişkî û hevkarîya sertaserê Kurdistanê. Dibû di paşerojê jî da her ew pilatfurme bibaye destgehek û navend û avakiriyeka Kurdistanî, xudan stiraîciyeka netewî.

7) kumîta berihevkar gotar û dirîşmek jibo kunfransî gelale kir, ku naveroka wî (aşî dinav da û aşî li der ve; diyalog dinavida û diyalok digel der ve; bi ramaneka dî aşî û diyaloga kurdî-kurdî û aşî û diyaloga kurdan digel der ve), ji aliyekî dî ve bi çî rengê merema konfransî ew nebû, ku çek dananê bi ser (pekekê) da bi sepînît, belkî ji aliyekî dî ve bangîna çareserî ya binikarî bi rêka aşî û diyalogî tekez bi bît. Bi ramaneka dî em diwê bawerê da bûyin, ku bi vî rengê gotarê dibît birek meremên netewî û herêmî bêne hingavtin û bizava ramiyariya Kurdistanê bi gotareka hevçerx û ji aliyê ramiyarî û dibilumasî ve (pirçek) biket.

8 -li çaxekî, xeberê bestina konfransê li hevlêrê heye, li derbarey wî konfransê çaverêkirî dê van çend xalên li xwarê berçav keyin:

A-em wek desteyek ji ronakbîrên Kurdistanê bi çî rengê, fermî yan nefermî, ji wî konfransê ku dixwazin li hevlêrê bêne bestin



nehatîne agehdarikirin û ne ji dûr û ne ji nêzîk me çî peywendî bi hewla wî konfransî nîne.

B-em we dizanîn armanca me jibo bestina kunfransekî diristê Kurdistanê û ew karê li demê çîwar salan me encam day digel berihvarkarî bo kunfransekî bi wî rengî bi çu awayekî û digel wî konfransî ku mereme li dahatê nêzîk li hevlêrê bi hête girêdan hev nagirît. Ji aliyekî dî ve kêmtirîn pêgîriya sincî ew e ku berihvarkarên konfransê çaverê kirî û bi taybetî serikirdatiya êketî û partî pêzanîn û helwêstekî fermî li ser karê desteya ronakbîrên Kurdistanê û kumîta berihvarkariy diyar biken. Bi dirisîfî heta niha çî pêzanîn û helwêstên fermî li ser kar û xebata me jibo bestina konfransekî bi dirisîfî Kurdistanê diyar nekirîne. Bila partî û êketî her çu nebît ewê jibo cemawerê xelkê Kurdistanê zelal biken; erê jibo biriyara nebestina wî konfransî dan ku merem bû li 16 , 17 , 18 uktobera sala par bête bestin, belê piştî çaxekî kêmtir xwekirin xudanên projey... Hema ne vexwandin. Belkî bikire vema lîn hewil û xebata ewên dî û nerêzigirtin û hindêk caran jî dagîrîkirina bizav û xebata ewên dî, pejiyeka ramiyariya kujeke û dinav keliturê ramiyaryê dîmukirasî jî da cihê wê nîne.

C-ji kujiyekî dilsuzyê ve gazî hemû wan hêz û kesanên ramiyarî û rewşenbîrî yên gazî kunfransê dahatî li hewlêrê dihênêkirin dikeyin, nebin pişkek ji yariyekê ku dumahîkê li şûna mifayê netewî ziyaneke netewî jê peyda bi bît. Ewa ku kurd li evro di pêtivîne ew e, ew îrade saleha sale ji wî netewey hatî ye berbenêkirin lê vegeirît, ne ku bi bê îrade û bi xwasta ewên dî bilivîfî û ew îrade berawêz bi bît...!





Di-ewa ku biriyar e li hevlêrê bêtekirin, salux û kesatiya ramiyariya kunfransî netewî werinagirît û di baştirîn seruberda kumbuneka taybete û jibo meremeka sinûrdar û çaxekî diyarikirî ye.

H-gelek giring e ew kes û Aliyên ku di mîdiyayan da derbarey konfransê netewî yê Kurdistanê pirsiyar jê dihêtekirin, bi taybetî ewên biriyar bû pişkdarî wî kunfransî bibin. Ku em helgirên ramanên wî bûyin û me kar jêra kir, agehdarî wan rastyên li serî bin û helwêstên xwe bi raşkawî zelal biken.

### **Desteyek ji ronakbîrên Kurdistanê**

(wek kiruka kumîta berihevkar konfransê Kurdistanê, Kurdistan di cîhaneka mişe guhartin da..., ku biriyar bû li hevlêrê li (16 , 17 , 18 uktobera sala par bête bestin).

25/3/2009

### **Têbînî:**

1 -tikaye bo bînîni ew projeyey ke ber le 4 sal pêşkeş be layene peywendîdarekan kirawe birwane:

Hittip: //ûw. Burhaniyassiin. Com/proje%201%20PDF. Pidif

2 -bo agadarî ziyatir derbarey ew konfranse Kurdistanîyey ke ême mawey çiwar sall karman bo kird, tikaye birwane em sê peywendiyey xwarewe:

[http://www.burhaniyassiin.com/Alay%20Azadi%202008\\_1.pdf](http://www.burhaniyassiin.com/Alay%20Azadi%202008_1.pdf)

[http://www.burhaniyassiin.com/Alay%20Azadi%202008\\_2.pdf](http://www.burhaniyassiin.com/Alay%20Azadi%202008_2.pdf)

[http://www.burhaniyassiin.com/Alay%20Azadi%202008\\_3.pdf](http://www.burhaniyassiin.com/Alay%20Azadi%202008_3.pdf)

Le pirosey amadekarîda nawî konfiranis gora le (kongirey Kurdistanî derbarey kurd û rojihelatî nowerastî mezin) bo (konfransî Kurdistanî: Kurdistan le cîhanêkî pir le guranda-diyalogêkî ekadîmî-siyasî).

Jibo zanîn di wê serdema burî da ev piro